## Tênînî

Em bi eşkere teşwîq dikin ku dêûbavên ku zarokên wan hewcedariyên wan ên taybetî hene, di dema qeydkirinê de me ji vê yekê haydar bikin. Ji kerema xwe vebijarka «Cihê entegratîv» (Integrativplatz) di bin beşa «Pêdiviyên lênêrînê» (Betreuungsbedarf) de hilbijêrin da ku zarokê we piştgirîya mebest werbigire.

## Arîkarî

Eger pirsên we hebin an pêdiviya we bi piştgiriyê hebe, ji kerema xwe bi Nivîsgeha Malbatê ya Bajarê Federal a Bonn'ê re têkilî dayînin

Thomas-Mann-Str. 2-4
53111 Bonn
Telefon: 0228 - 77 40 70
E-name: familienbuero@bonn.de

## Girêdank

- Portala dayîkbavan
  *www.kita-net.bonn.de*

- Tora Lênêrîna Rojane ya Zarokan a Bonn'ê
  *www.netzwerk-kindertagespflege-bonn.de*

- Nivîsgeha Malbatê
  *www.bonn.de/familienbuero*

www.bonn.de | Zanyariyên weşanger: Şaredarê Bajarê Federalê Bon, Ofîsa Zarok, Ciwan û Malbatê/Buroya Çapemeniyê, Protokol û Têkiliyên Giştî, Adar 2024, © Markus Erdmann, Foto: © Heike Heiliger, li ser kaxeza 100% jinûvebikarhatî hatiye çapkirin ku bi nîşana Melekê Şîn hatiye piştrastkirin.

FREUDE.
JOY.
JOIE.
BONN.

# KITA-NET Bonn

Portala dayîkbavan a Bajarê Federal a Bonn

Kurdisch (Kurmanji)





## KITA-NET Bonn

Portala dayîkbavan derfetê dide we ku ser hemû cihên ku ji hêla hukûmetê ve tên diravdayîn li **navendên lênêrîna rojane (Kîta)** û li **cihê lênihêrîna rojane ya zarokan (KTP)** li navçeya bajarê Bonn'ê zanyariyan wergirin. Hûn dikarin pêdiviya xwe ya bo cihekî li navendeke lênêrîna zarokan bi awayê online tomar bikin û serî bidin li Kîtayên ku we hilbijartiye û/an jî Tora Lênêrîna Rojane ya Zarokan a Bonn'ê, bidin.

## Portala dayîkbavan

Bo serîlêdaneke online, di portala dayîkbavan de hesabê xwe yê bikarhêner biafirînin.

**Portal bijardeyên jêrîn pêşkêşî we dike:**

- serîlêdana çend **Kîta**yan
- bi **KTP** a Bonn'ê (Netzwerk Kindertagespflege Bonn)
- guhertina serîlêdanên xwe di her gavê de
- wergirtina venêrîneke serîlêdanên xwe
- wergirtina zanyariyan ser rewşa heyî ya pêkanîna serlêdanên we
- wergirtina erêkirina pêdiviyên lênêrîna zaroka we

Bi riya smartfon, tablet an kompûterê hûn li her dem û li her deverê dikarin ji serîlêdan, pejirandin û redkirinên xwe agahadar bin.



## Pêvajo

Bername dê pêşniyarên ku hene nîşanî we bide û hûn niha dikarin dest bi tomarkirina zaroka xwe li dezgehên ku hene bikin.

Hûn ê bi riya portala dayîkbavan bi berdewamî li ser rewşa zaroka xwe ya di lîsteya bendewariya navenda lênihêrîna zarokan de agahdar bibin. Eger hûn li **cihekî di KTP** de digerin, divê hûn bi **Tora Lênêrîna Rojane ya Zarokan** re jî têkilî dayînin.

Eger cihekî vala li **Kîta**'yê peyda bibe, ev ê bi erêkirina **Kîta**'yê ya di portala dayîkbavan de ji we re were ragihandin. Erêkirinên ji bo destpêkirina sala zarokistanê (1ê Tebaxê) heta meha Sibatê ya heman salê nayên dayîn.

Divê hûn di nav 14 rojan de cihekî lênihêrîna zarokan qebûl bikin. Wekî din, erêkirin dê xwebixwe bibe wekî redkirin.

Eger hûn cihekî erêkirî bi teqez qebûl bikin, dê hemû serîlêdanên bo vê zarokê li navendên din ên lênihêrîna zarokan werin betalkirin.

Bêguman, ev pêvajoya online şûna civîneke kesane ya li **Kîta** û **KTP** nagire. Kesên berpirsiyar dê we agahdar bikin kingê û çawa ev dikare were kirin.